Ronahî
Şopdara Rastiyê ye
Rojnameya siyasî, civakî û çandî Jimar :1274 18-Gulan-2025 www.ronahi.net/ku/

Navnîşan
www.ronahi.net/ku/ rojnameyaronahi @ronahikurdi55
nameronahi@gmail.com Rojnameya Ronahî +963 984 370 218

# Biradost Mîtanî; Hezkerê dîrok û zimanê gelê xwe

Ayşa Silêman/Dêrik

**Dîroknasê Kurd Biradostê Mîtanî diyar kir ku hezkirina wî ji zanist û dîroka gelê kurd re ji zaroktiya wî ve dest pê kiribû, lewma wî ev rê hibijart û heya îro jî bênavber didomîn e.**

Dîroknasê Kurd Evdilhekîmê Mele Emer ku bi navê Biradostê Mîtanî tê naskirin, di sala 1960'î de li gundê Xirbê Cihiwa jidayîk bûye. Wî dibistana seretayî li gundê xwe qedandiye û ya navîn li dibistanên bajarê Rimêlanê bi dawî kiriye, piştî wê beşê pêşesazî li bajarê Hesekê bi dawî kiriye. Li Dêra zorê jî, ji paymangeha pêşesazî, beşê miknisyanî derçû ye. Niha jî li bajarê Girkê Legê dijî.

Di derbarê jiyan û kar û xebatên xwe de, dîroknasê kurd Biradost Mîtanî ji Rojnameya me re axivî.





### Kurtejiyana Biradost Mîtanî

Mîtanî da zanîn ku wî bawernameya qonaxa amadeyî a wêjeyî bi şêweyê azad bi dest xist û piştre xwe li zanîngeha Şamê tomar kiriye û wiha got: "Ji ber hezkirina min ji zanist û dîroka gelê Kurd re, min beşê dîrokê di fakulteya wêjeyî li zanîngeha Şamê xwend, piştî derçûna ji zanîngehê min karê mamostetiyê li hin gundan kir û piştî wê bi rengekî fermî li Rimêlanê min dest bi mamostetiyê kir. Ji berya 38 salan ve û heta roja îro bê rawestandin di nav xebatên perwerdê de me, tevlî ku rêjîma Baas ez di sala 2013'an de, ji erkê mamostetiyê dûrxistim. Ev yek ji ber rol û çalakiyên min ên rewşenbîrî û perwerdehî di layê ziman û dîroka Kurdî de, nexasim dema ku min karî bû dîroka Kurdî ya rast û ya miletên din yên li herêmê dijîn jî derim holê. Her wiha min karîbû ku xwehrî û çewtiyên li ser dîroka me Kurdan bi belgeyan û bi zanebûn rake. Min di gelek çalakiyên di warê guftûgo, vejîn, zindîkirina helkeftinan, diyarkirin û eşkerekirina dîroka kurdî de û di hemû warî de jî bêhempa kedê bidim û pêve mijûl bibim."

### Kar û xebatên wî

Mîtanî diyar kir ku bi sedan gotar û lêkolînên wî yên dîrokî hene û wiha got: "Min gelek sîmînar li piraniya bajarên herema Cizîrê dane, di heman demê de ez endamê komîta perwerdê ya Ekadimiya Civaka Demokratîk, civaka milî û



rewşenbîrî me. Her wiha ji dema ku hîn rêjîma Baas li ser desthilatiyê bû mala min bi dergehekî fereh û bi rengekî razyarî û veşartî ji hemû çalakiyên welatparêziyê re vekirî bû. Di heman demê de rola min hebû di warê belavkirina têgeh û hestên neteweyî, rewşenbîrî û zimanê Kurdî de. Min bi hezaran ciwan li ser zimanê Kurdî ji asteyên 1, 2 û 3 perwede kirine û wane dane dibistanên herêma Girkê Legê jî. Piştî Şoreşa Rojava ez bûm rêpêşan, şêwermend û piştre endamê Komîta Wêjeya Zimanê Kurdî ye di S.Z.K."

### Di gelek waran de xwedî rol bû

Mîtanî axaftinên xwe domand û wiha got: "Min dîdageha Girkê Legê ya rewşenbîrî di sala 2006'an de ava kir. Di destpêka Şoreşa Rojava de xwedî rol bûm di avakirina Saziya Zimanê Kurdî li navçeya Girkê Legê de, avakirina Saziya Nûrî Dêrsimî li Rimêlan, avakirina Yekîtiya Mamosteyan di Girkê Legê û Rimêlanê de û bûm hevserok di Yekîtiya Mamosteyan li Girkê Legê û piştre hevserokatiya Yekîtiya Mamosteyên Kantona Cizîrê re di sala 2014'an de kiriye. Di heman demê de Endamê Yekîtiya Nivîskarên Kurd li Sûriyêye bûm. Berî Şoreşa Rojava li Girkê Legê ez Endamê Komîta Rêvebir a Rêxistina Aştiya Civakî bûm. Her wiha di sala 2014'an de xwedî rol bûm di avakirina Yekîtiya Rewşenbîrên Herêma Cizîrê de û min cihê xwe di hevserokatiya şaxê nivîsgehê ya di Girkê Legê de girt û piştre bûm endamê Desteya wê ya Rêvebir ya giştî. Niha jî endamê Yekîtiya Rewşenbîrên Herêma Cizîrê me. Bêhtîrî salekî endamê Navenda Lêkolînan a Desteya Perwerdê ya Bakur û Rohilatê Sûriyê bûm."

### Berhemên Biradost Mîtanî yên çapkirî

Berhemên nivîskar û dîroknasê Kurd Biradost Mîtanî wiha ne:
-Pirtûka rêzmana Kurdî bi navnîşana Gurzek Gul Ji Baxê Zimanê Kurdî
-Pertûka bi zimanê erebî bi navê Dergehek ji bo dîroka kurdî ya kevnar, Kurdistan ji serdemên kevirî yên kevnar heta hatina misilmantiyê.
- Pirtûka bi Kurdî bi navê Kurtedîroka gelên Rojhilata Navîn û têkilyên wan bi hev re.
-Pirtûkek bi zimanê erebî bi navê Elberzex.
- Pirtûkek bi kurdî, bi navê Bergihek ji Zanista Kurdî.
Herwiha wî di kesên din destana Derwêşê Evdî ya nivîskar Eyûb Kiran, ji Kurdî wergerandin Erebî.

### Berhemên ku hîn nehatine çapkirin

Dîroknas Biradostê Mîtanî di dawiya axaftina xwe de wiha got: "Ji destnivîsên min yên bi zimanê erebî û neçapkirî 10 berhem hene, dibin zincîrek bi sernavê Ehdas Min Ehwal Kurd û Kurdistan. Carcaran ez helebestan jî dinivîsim, dema ku wan komî ser hev bike, wê bibin dîwanek. Ji destnivîsên min yên bi zimanê kurdî û neçapkirî 30 berhem hene bi sernavê bûyerên ji rewşa kurd û kurdistanê. Niha jî li ser danîna pirtûkekê bi erebî xebat dike navê wê Puxteyek li ser hebûna gelê Kurd di Sûriyê de, ji dema berbanga dîrokê ve, ew jî du beşin."

Sudoku: Bersiv 40

| | | | | | | | | |
|---|---|---|---|---|---|---|---|---|
| 4 | 2 | 5 | 9 | 8 | 3 | 1 | 6 | 7 |
| 8 | 7 | 3 | 5 | 1 | 6 | 4 | 9 | 2 |
| 6 | 1 | 9 | 7 | 2 | 4 | 8 | 3 | 5 |
| 9 | 8 | 4 | 2 | 6 | 7 | 5 | 1 | 3 |
| 1 | 5 | 6 | 4 | 3 | 9 | 2 | 7 | 8 |
| 2 | 3 | 7 | 8 | 5 | 1 | 9 | 4 | 6 |
| 3 | 6 | 2 | 1 | 9 | 5 | 7 | 8 | 4 |
| 5 | 4 | 1 | 3 | 7 | 8 | 6 | 2 | 9 |
| 7 | 9 | 8 | 6 | 4 | 2 | 3 | 5 | 1 |

Sudoku:Pirs 41

| | | | | | | | | |
|---|---|---|---|---|---|---|---|---|
| 1 | | | 9 | | | 7 | 6 | |
| | | 5 | 2 | 8 | | | | 4 |
| | | 4 | | | | 9 | | 2 |
| | 5 | | | 2 | 8 | | 3 | |
| | | | | | | | | |
| | 7 | | 3 | 1 | | | 4 | |
| 8 | | 7 | | | | 1 | | |
| 9 | | | | 4 | 2 | 5 | | |
| | 2 | 3 | | | 6 | | | 9 |

## FERHENGA BIWÊJAN

**Kurê bavê xwe ye:**
- Jîr e; jêhatî ye; dest hiltîne; ne kêmê bavê xwe ye.
**Li deh avan bide çoka wî ter nabe:**
- Nayê xapandin; ti kes pê nikare; jîr e; bi kêrî xwe tê.
**Li vir dimîze li Bexdayê giya li ber mîza wê zer dibe:**
- Pir jêhatî ye; şatirşûman e; ti kes nikare pê re bibe serî; ti kes pê nikare.
**Mirov dibêje qey neketiye nav paçikan:**
- Pir jîr e; pir jêhatî ye:
**Mûyan ji maran dike:**
- Pir jîr e; jêhatî ye; dikare her kesî bixapîne.
**Mûyan ji kêçan dike:**
- Bi heman wateyê.
**Nanê xwe ji kevir dertîne:**
- Mirovekî bikêr e; bira ye; li xwe namîne heyrî; mirovekî kedkar e; biaqil e; zana ye; ji karê aboriyê fêm dike.
**Ne çûkê davikan e:**
- Ne xeşîm e; zana ye; nayê xapandin.
**Ne hinge/hindî xwe ye:**
- Ew jî têra xwe heye; ji heq xwe derdikeve; ne feqîr e; ne honik e.
**Pisîka heftruhî ye:**
- Haya wî ji her derê, ji her tiştê heye.
**Rûvî ye:**
- Jîr e; xapînok e; xwe nade dest; qurnaz e; ti kes nikare bixapîne.
**Sipeha bin êş e:**
- Nayê xapandin; di fen û lîstikan de ti kes pê nikare.
**Sipeha genim e/sibehka genimî ye:**
- Bi heman wateyê.
**Siwaran peya dike:**
- Pir birû ye; pir şûm e; jêhatî ye. Şeytan gotiye pişk, wî gotiye va ez:
- Nehs e; jîr e; şûm e.
**Şivê li xwe nade:**
- Zîrek e; di bin bar de xweş dimeşe; ji ber ku bixwe dimeşe pêwîst nake mirov lê bixe.
**Şîr ji mêşê didoşe:**
- Pir jîr e; pir jêhatî ye; birra ye; kar pê dibin; pêbî ye.

Ji Pirtûka Ferhenga Biwêjan Ya Diyar Bohtî

## 'Aştiya civakî xeyalê Sirri Sûreyya Onder yê mezin bû'



Hevserokê şarederiya bajarê mezin ê Mêrdînê Ahmet Turk xuya kir ku Sirri Sûreyya Onder fedayê aştiyê bû û wiha got: "Bi eslê xwe Tirk bû, lê di kesayeta xwe de ew mirovekî sosyalîst, demokrat û şoreşgerekî enternasyonalîst bû."**R-4**

## 'Parastina jîngehê parastina jiyanê ye'

Endama Beşa Lêkolîn û Plangeriyê ya Desteya Jîngehê ya Kantona Cizîrê Maya Miswer diyar kir ku xebatên wan ji bo parastina jîngehê di asteke baş de têne meşandin û wiha got: "Em her sal zêdebûna deverên kesk, daran, parastina parastgehan wek proje digrin dest, ji ber ku parastina jîngehê parastina jiyanê ye."**R-6**

DESTEYA JÎNGEHÊ

Ronahî
Şopdara Rastiyê ye
Rojnameya siyasî, civakî û çandî Jimar : 1274 18-Gulan-2025 www.ronahi.net/ku/ Nirx: 500 L.S

## Kongra Yekmîn a Meclisa Jinan a TEV- DEM




Hevseroka Tevgera Civaka Demokratîk TEV-DEM Remziya Mihemed diyar kir ku li gorî biryarên Kongra TEV- DEM ku di sala 2024`an de hatbûn derxistin, kongra yekmîn ya Meclisa Jinan a TEV- DEM di 8`ê Gulanê de li ser asta Bakur û Rojhilatê Sûriyê hate lidarxistin.**R-2**

# RAMANÊ RÊBER APO YEKÎTIYA GELAN PÊK ANÎ

Felsefeya jiyana azad a ku Rêber Apo afirandiye, ji bo tevahî gelên azadîxwaz bû pênaseya jiyan, hebûn û nasnameyê. Rêber Apo ji bo wekhevî, hevgirtin, rêxistinkirin û azadiya gelan têkoşîneke bêhempa da û dide meşandin. Rêber Apo ji bo ku azadiya gelan misoger bike, bawerî û hêviyê ji nû ve zindî bike, berxwedaneke ku mînaka wê li cîhanê tuneye nîşan da û pêş xist. Ew kêlî bi kêlî ji bo azadî û hevgirtina gelan berxwedana xwe ya dîrokî didomîne. Tevahiya gelên herêmê jî di ber azadiya fîzîkî ya Rêber Apo de berpirsyar in.**R-3**




## 'Hîna zimanzan mijara zimanê kurdî li gel hev nîqaş nekirine'




Zimanzan û nivîskar Berzo Mehmûd diyar kir ku ziman stûna gel e, zimanê Kurdî ne lawaz e, zimanzanên Kurd astengiyan çêdikin. Herwiha Mehmûd da zanîn ku hîna mijara rêzmanê kurdî nebûye derd ji bo rewşenbîr û zimanzanên Kurd li Rojava û nîqaş di navbera wan de çênebûye.**R-7**

## 109 sal di ser Peymana Sykes-Picot re derbas dibin




Hevpeymana Syeks Picot bandoreke mezin bi giştî li gelên herêmê kir, gelê Kurd ji gelên ku herî zêdetir êş kişand û heta niha bandora peymana kolonyalîst di hemû warên jiyanî, aborî, siyasî û çandî de berdewam e.**R-5**



**Şoreş, li Rojhilat ketiye rojevê**
Ahmet Aktaş R-4

# Kongra Yekmîn a Meclisa Jinan a TEV- DEM

**Hevseroka Tevgera Civaka Demokratîk TEV-DEM Remziya Mihemed diyar kir ku li gorî biryarên Kongra TEV- DEM ku di sala 2024`an de hatbûn derxistin, kongra yekmîn ya Meclisa Jinan a TEV- DEM di 8`ê Gulanê de li ser asta Bakur û Rojhilatê Sûriyê hate lidarxistin. Herwiha di kongirê de li ser gelek xal û mijaran hatin nîqaşkirin.**

**Dîlan Mulhim\Qamişlo**

Di 8`ê Gulana 2025`an de Meclisa Jinan a Tevgera Civaka Demokratîk TEV-DEM'ê bi dûrişmeya"Jina birêxistinkirî garantiya avakirina civaka demokratîk e" kongrê xwe yê yekemîn li ser asta Bakur û Rojhilatê Sûriyeyê li dar xist. Di derbarê vê mijarê de Hevseroka TEV-DEM'ê Remziya Mihemed ji Rojnameya me re axivî.

### Kongra Yekemîn a Meclisa jinan a TEV- DEM'ê


Remziya Mihmed anî ziman ku di 8`ê Gulanê de Meclisa jinan a TEV- DEM'ê bi dûrişmeya "Jina birêxistinkirî garantiya avakirina civaka demkoratîk e" kongireya xwe ya yekem li ser asta Bakur û Rojhilatê Sûriyê ava kir û wiha got: " Li gorî biryarên kongirê TEV- DEM'ê ku di sala 2024`an de hatbûn derxistin û li ser vî bingehî Meclisa Jinan a Tevgera Civaka Demokratîk TEV-DEM'ê kongirê xwe yê yekemîn li ser asta Bakur û Rojhilatê Sûriyê ava kir. Herwiha kongrê me bi beşdarbûna 350`î belgeyî li ser asta kantona Cizîrê li bajarê Hesekê hate lidarxistin. Di kongrê de gelek saziyên jin yên Bakur û Rojhilatê Sûriyê hazirbûn weke Meclisa Kombûna Zenûbiya û kongra Star. Di heman demê de kesên ku tevlî kongrê bûn kêfxweşiya xwe ji bo avakirina yekemîn kongirê Mecilsa Jinan a TEV-DEM 'ê diyarkirin. Ji ber ku dîtin ku ev care yekemîn e Meclisa Jinan a Tevgera Civaka Demokratîk TEV-DEM'ê kongrekî bi vî rengî ava dike."

### Xalên ku di kongirê de hatin nîqaşkirin

Remziya Mihmed da zanîn ku xala serek a ku di kongirê de li ser hate seknandin ew jî di Şoreşa Rojava de têkoşîna ku jin daye meşandin û wiha berdewam kir: " Di kongrê de ji bo jinan li ser gelek xalan hat nîqaşkirin, herwiha xala sereke di Şoreşa Rojava de têkoşîn û berrxwedaniya ku jin daye meşanid bi taybet li ser vê xalê hate nîqaşkirin. Ji ber ku jin ji destpêka Şoreşa Rojava ve berxwedanî û têkoşîneke bêhempa dide meşandin û pêşengtiyeke mezin ji Şoreşê re kir. Lewma em dibînin gelek serçeteyên girêdayî dewleta Tirk a dagirker mîna Mihmed Casim Ebû Emşa, Hatim Ebû Şeqra û hwd di nava desthildatdariya Şamê ya nû de weke fermandar tên erkdarkirin. Ev kesên ku destê wan di kuştina jinan û tevahiya gelê Sûriyê de heye pêwîst e hebûna di Sûriya nû de nebe.Ji ber vê yekê di kongirê Mecilsa Jin a TEV- DEM'ê de me helwestên xwe diyar kir ku nabe kujerên jinan di nava desthildariya Şamê ya demkî de werin erkdarkirin. Me got em ê asta têkoşînê bilind bikin, ji bo kesên sûcdar di asta navdewletî de werin cezakirin û li ser vî bingehî xebatên me berdewam bikin."

### Mijarên di kongirê de hatin xwendin

Remziya Mihemed eşker kir ku di mijarên kongirê de perspektîfên Rêber Apo ji bo jin û civaka Demokratîk were avakirin hate xwendin û wiha pê de çû: "Di kongira mecilsa jina ya TEV-DEM'ê de banga Rêber APO a bi navê Aştî û Civaka Demukratîk hate xwendin. Herwiha xebatên jin ên ku di salên dirêj de dide meşandin û zehmetiyên ku li pêşiya wê derdikevin weke semînerekê di kongirê de hate pêşkêşkirin. Beriya ku kongire were lidarxistin ji aliyê hemû yekîtiyan ve tûzika mecilsê ku weke reş nivîs hatibû amedekirin hat xwendin û nêrîn hatin girtin, herwiha di hundirê kongirê de jî hate pêşkêşkirin. Bi taybetî mijara herî girîng berdevka meclisa jin ya Tevgera Civaka Demokratîk TEV- DEM'ê hate hilbijartin û di



hundirê kongirê de hate erêkirin. Cîger û endamên mecilsa Jin a TEV- DEM'ê di hundirê kongirê de hatin erêkirin. Lewma di kongirê de li ser mafê jinê di Sûriya nû de hate tekezkirin û taybet di aliyê hikûqî de, da ku jin karibe îradeya xwe di nava Sûriya nû de temsîl bike."

Hevseroka TEV-DEM'ê Remziya Mihemed axaftina xwe wiha bi dawî kir: " Ez bi hêvî me ku tevahî jin bi rola xwe ya ji bo aştî û demokrasiya civaka xwe rabin û bixebitin. Herwiha pêwîst e ku em dengê xwe bighînin tevahiya jinên Sûriyê ji bo ku em karbin bi hev re xebatekî hevbeş bidin meşandin. Da ku em karibin rola xwe di Sûriya nû de bilîzin."

# Ji Kongreya NADA'yê peyama çalakvanên Îranî: Şoreş sînoran nasnake

**Çalakvanên Îranî di Kongreya NADA de axivîn û tekez kirin ku jin di xeta berxwedana herêmî de yekgirtî ne û gotin, "Bi bandora serhildana Jin Jiyan Azadî, jinên Îranî niha bi perspektîfek vekirîtir û gerdûnî nêzî têkoşînê dibin."**

Hevgirtina Jinên Demokratîk a Herêmî ji bo Rojhilata Navîn û Bakurê Afrîkayê (NADA) li Silêmanî ya Başûrê Kurdistanê, bi dirûşmeya "Bi Şoreşa Jinan Ber bi Civakeke Demokratîk ve" û beşdariya 200 delegeyên ji 19 welatên cuda, 1emîn kongreya xwe li dar dixe. Di roja xwe ya duyemîn de, çalakvana siyasî Mehdiye Mîrhabîbî û endama Konseya Platforma Demokratîk a Îranê Besî Şemerî derbarê têkoşîna jinan de ji ajansa me re nirxandin kirin.

### Mehdiye Mîrhabîbî: NADA hêviyek e ku ji sînoran wêdetir e

Mehdiye Mîrhabîbî diyar kir ku



kongre dîrokî ye û got ku NADA hêviyek e ku wêdetirî sînoran e. Mehdiye Mîrhabîbî li ser bandora serhildana "Jin jiyana azad" a li Îranê dest pê kir axivî û got, "Ev hevgirtin ji perspektîfeke siyasî û civakî ve pir girîng e ji ber ku şîdeta li ser bingeha zayendî ya ji ber şer û wêrankirinê li van herêman zêde dibe."

Mehdiye Mîrhabîbî tekez kir ku jinên Îranî ji perspektîfek gerdûnîtir nêzî têkoşînê dibin û got, "Êdî ne mimkûn e ku tenê di nav sînorên Îranê de guhertin were xwestin. Beşdarbûna di tevgerên herêmî û navneteweyî de îro bûye pêdivîyek."

### Besî Şamarî: Divê jin di pêvajoyên guhertina herêmî de rolên bi bandor bilîzin

Endama Konseya Platforma Demokratîk a Îranê Besî Şamarî, diyar kir ku kongre dikare bibe xala destpêkê ya yekîtiyek mayînde û got, "Ez hêvî dikim ku di pêşerojê de, NADA dikare jinên çalak ji neteweyên cûda di nav xwe de bigire. Divê jin di pêvajoyên guhertina herêmî de rolên bi bandor bilîzin. Piştî daxuyaniya dîrokî ya Birêz Ocalan a li ser bidawîbûna şer di 27'ê Sibatê de, di têkoşîna azadiyê de asoyek nû vebû; xala destpêkê ya vê asoyê azadiya jinan e."

Besî Şamarî tekez kir ku tevgerên jinan bi hev ve girêdayî ne û axaftina xwe bi van gotinan domand: "Hemû tevgerên ku ji hêla jinan ve têne rêvebirin mîna xelekên zincîrekê bi hev ve girêdayî ne. Ev kongre dikare ji bo jinên li Îranê yên ku azadiyê dixwazin modelek piçûk lê zindî be. Îran welatek e ku xwedî asteke bilind a cihêrengiya etnîkî û çandî ye, û jin bi salan e li vir bi zilm û cudakariyê re rû bi rû ne."

### Serhildana 'Jin Jiyan Azadî' şoreşeke zîhniyetê ye

Besî Şamarî serhildana "Jin jiyana azadî" wekî şoreşek zîhniyetê bi nav kir û destnîşan kir ku serhildan ber bi sala xwe ya sêyemîn ve diçe. Besî Şamarî got, "Her kes dizane ku dengê jinên li Îranê yên ku azadiyê dixwazin çawa gihîştiye cîhanê. Niha dem hatiye ku ev deng di nav hevpeymaniyên sazûmanî û cidî de laşek bibîne."

Besî Şamarî bertek nîşanî girtina çalakvanên têkoşîna jinan da û got, "Zeynep Celaliyan, Pexşan Ezîzî û Werîşe Muradî bûn dengê jinan. Ew ne tenê kes in; ew hilgirên manîfestoyekê ne, îdeolojiyeke gerdûnî ne ji bo azadiya jinan.

Li cihê ku behsa azadiya jinê tê kirin bila ala Zeynep Celaliyan, Pexşan Ezîzî û Werîşe Muradî li ba bibe. Ev ne tenê nîşanek rêzgirtinê ye, lê di heman demê de pêdiviya me bi modelek e ku tevgera jinan kurevî bike. Ev tevger êdî ne tenê berxwedaneke herêmî ye, ew dengê hemû jinên bindest ên sedsala 21'an e." **NÛJÎNHA**



# 'Hîna zimanzan mijara zimanê kurdî li gel hev nîqaş nekirine'

**Zimanzan û nivîskar Berzo Mehmûd diyar kir ku ziman stûna gel e, zimanê Kurdî ne lawaz e, zimanzanên Kurd astengiyan çêdikin. Herwiha Mehmûd da zanîn ku hîna mijara rêzmanê kurdî nebûye derd ji bo rewşenbîr û zimanzanên Kurd li Rojava û nîqaş di navbera wan de çênebûye.**

**Hemza Sêvo/ Qamişlo**

Mijara zimanê Kurdî li Rojava li gel derfetên heyî ji bo nivîskar, rewşenbîr û saziyên têkildarî perwerde û fêrkirina zimên xwedî girîngiyekê ye. Tevî ku 73 sal li ser destpêkirina bi kurmanciya latînî derbas bûye hîna pirtûkeke tekane û weşan, nivîs û pergalkirî di nêrîna gelek rewşenbîr, zimanzanên kurdan de çênebûye. Li hêleke din tevî ku di nav saziyên cihêreng ên Rêveberiya Xweser de zimanê Kurdî bûye yek ji zimanê fermî di nêrîna piraniya zimanzan û kesên lêkolînê li ser zimanê Kurdî çêkirine, aloziyê dibînin. Di derbarê van mijaran de bi boneya Roja Zimanê Kurdî zimanzan û nivîskarê Kurd Berzo Mehmûd ji rojnameya me re axivî.

### 'Ziman stûna gel e'

Mehmûd da zanîn ku ziman stûna gel û gelê Kurd jî gavên pêşketî li Rojava avêtin û wiha got: "Ziman stûna gel e stûna pêşketinê ye, ziman raburdûya rewşenbîriyê ye, herweha di derbirînê de êstaya



rewşenbîrî ye. Îro, zimanê me ji dagirkirinê rizgar bûye, kur û keçên miletê me fêrî xwendin û nvîsîna Kurdî bûne. Ji xwe zimanekî ku sedsalî di girtîgehê de bû, dê gelek êş û nexweşî lê peyda bibin lawazî û hejarî û bêferhengî. Lê dîsa miletê me li ber xwe dide, zimanê me gavên pêşketî pêktîne, em bihêvî ne ku di salên bê dê gelek gavan biavêje. Em dikarin bêjin ku pêşketina ziman li Rojava du prose di piratîkê de dane pêş, yek jê xwendin e, ya duwem jî nivîsîn e. Zarokên Kurd bi piranî fêrî Kurmanciyê bûne, lewra jimara axêverên Kurmancî di xwendin û nivîsînê de zêde bûye û ev zêdebûn hin bi hin zêdetir dibe. Ziman jî eger nekeve axaftinê de, ew ziman mirî ye."

### 'Kêmasî ne di ziman de ye, zimanzan astengiyan çêdikin'

Berzo Mehmûd tekez kir ku zimanê Kurdî ne qels e, lê zimanzanên Kurd astengiyan derdixin ji bo zimên û wiha domand: "Ji bo pêşketina zimanê Kurdî, pêwîst e zimannas bi aqilekî gihaştî, têr-ezmûn û pispor kar û têkoşînê bikin, bi armanca pêşvebirina ziman di aliyê ferhengî de ku nwênerayetiya şaristanî bike. Ev kêmasî û alozî ne di ziman de ye, di xwediyê ziman de ye, lê wek diyar e li şûna ku pêş bixe, astengiyan li pêşiya ziman çêdikin, wek çawa pirtûka Rêbera Rastnivîsînê ya 2019'an ji alîkî ve û pertûka Rêzimana Kurmancî ya SZK'ê ji alîkî din ve bi armanca standerkirina Kurmancî xwestin ku hin rêkarên ristesaziya devoka Badînanî li zarê Kurmancî stander bikin, ango rêzimana sîntaksa Kurmancî. Armanca van herdu pertûkan ew e ku bi bihaneya standerkirina zarê Kurmancî, guhertinekê di rêzimana Kurmancî de pêk bînin, ku hîç wate jê re nîne. Berî her tiştî em wê yekê tekez dikin ku rexnên me li van herdû pertûkan tenê di xalên taybet de ne, ku ew jî giringiyeke xwe di rêziman û sîntaksê de heye, ne ku di tevahiya xalên rêzimanî û leksîkî yên di zeviya van herdû pertûkan de digere, ji ber ku di hin aliyan de pirsgirêk nîne, ya dîtir jî em pêrgî şêwaz û awayê şîrovekirinê nabin, ji ber ku nivîser serbest e çilo kêşeyê pêşkêş dike yan çi têrman bikar tîne."

### 'Mijara ziman di navbara zimanzanan de bi sîstematîk nîqaş nebûye'

Berzo destnîşan kir ku hîna mijara rêzmana kurdî nebûye derd ji bo rewşenbîr û zimanzanên Kurd li Rojava û nîqaş di navbera wan de çênebûye "Şêweyê şîrovekirina rêzimana Kurdî nebûye derd li nik rewşenbîr û zimannasên Kurd ji bilî ku partiyên siyasî jî her yek xwe bi komek nivîser ve girê didin, bi ser ku ziman kêşeyeke netewî ye, ango civak hemû tê de berpirs e. Lê eger zimannas lê napirsin, civak wê çawa pirsyanê lê bike. Awayê nivîsîna Kurdî di navbera zimannasan de bi rêbazekî zanistî û civakî nebûye cihê nîqaş û şîrovekirinê."

### 'Divê SZK'ê korsên ziman bide karmendên saziyan'

Nivîskar û zimannasê Kurd Berzo Mehmûd diyar kir ku divê perwerdeya zimanê Kurdî ji bo karmendên saziyên Rêveberiya Xweser ji hêla SZK'ê ve bê dayîn û wiha axivî: "Di baweriya min de kêmasî û alozî ji xwe heye, yê ku kar û xebatê bo pêşxistina zimanê xwe nake û hîç guhdan lê nîne. Ev nêzîkî pazde sala ye ku kurd li Rojava serbest in ku xwe fêrî zimanê xwe bikin, lê di baweriya min de kêmasî hem ji kesên kurd ve heye, hem jî rêveberî jî ne hewqas rijd e di warê fêrkirina miltet ji zimanê kurdî re. Ya dîtir jî bo ku em civakê ber bi fêrkirina zimên ve bibin, pêwîst e bernameyên xwendinê bi awayekî zanistî bêne drustkirin, da ku civak bixwênin û paşê bikevin ezmûnê de. Ya dîtir jî korsên ziman ji fermanberan û karmendan re çêbibin, pêwîst e Saziya Ziman(SZK) bi vê xebatê rabe."

# Cihê arkeolojîk ê Tilbeyder nasnameya gelên herêmê temsîl dike

**Hêvî Keleş/ Qamişlo**

**Bajarokê Tilbeyder yek ji kevntirîn şûnewarên kantona Cizîrê dihewîne, dîroka girê wê vedgere 3 hezar sal B.Z.**

Til Beyder Cihê arkeolojîk ê Girê sereke rûberek nêzîkî 28 hektar digire nav xwe û firehiya wê nêzîkî 2 kîlometre ye. Yek ji navendên herî girîng ên Împeratoriya Akad tê hesibandin.

### Çîroka navê gund

Bajarokê Tilbeyder, ku wekî "Nebada" dihat nasîn, şendeya Ewropî ya ku li wir kolandin dikir "Nabada" keşf kir, û ev nav ji arkeologên ku li cihê arkeolojîk ê Eblayê amade bûn hat. Navê Nebadeyê vedigere heta Nakar û îro wekî Tell El-Barak tê zanîn. Nabad di wê demê de ji bo bazirganan cihekî stratejîk û rêyek bû. Navê Tilbeyder ji wê rastiyê hatiye ku gir xwedî şiklê nîvheyvê an tacê ye û du dîwar û heft derî hene, ku her derî li deverek taybetî dinêre. Tilbeyder ew bi heft deriyên xuya ve girêdayî ye, ku bi îhtîmaleke mezin deriyên ketina kevnar ên vê deverê ne ku ber bi bajarên girîng ên kevnar ve diçin: Nagar: Tell Brak - Nînewa - Urkêş - Rirê Mozan - Mardîn - Tell Xueyra - Ebla: Tell Mardîx - Mari: Tell Herîrî. Ev heft derî girîngiya stratejîk a tevgera bazirganiyê di hezarsala sêyemîn a berî zayînê de nîşan didin.

### Di sala 1992"an de hat dîtin

Girê sereke rûberek nêzîkî 28 hektar digire nav xwe û firehiya wê nêzîkî 2 kîlometre ye. Ew ji deştên derdorê bi qasî 27.5 metre û ji asta deryayê 387 metre bilindtir e. di sala 1992'an de ji hêla şendeyek hevbeş ya Ewropî ve hate keşifkirin. Di encama kolandinan de, bloka mîmarî ya di hundirê wê de hate keşifkirin, ku ji çar perestgeh û du qesran pêk tê ku di sê qonaxan de hatine çêkirin. Mala Hejmaran taxeke xanîyên taybet e ku ji çend odeyên bi mezinahîyên cuda pêk tê ku li qiraxên kolanekê ne ku bi kevirên bazalt hatine çêkirin. Li nîvê kolanê kanalek avdanê heye û nêzîkî 141 tabletên bi nivîsên mîxî û 230 belgeyên nivîskî yên ku dîroka wan vedigere sala 240 berî zayînê li wir hatin keşifkirin. Kavilên Tel Beydar Deriyê Akropolîsê û kolana sereke jî di nav xwe de digirin, ku li ser sînorê başûrê Akropolîsê ye û yek ji avahiyên herî girîng tê hesibandin. Cihê arkeolojîk ê Tilbeyder yek ji cihên stratejîk ên bajêr e. Ew di encama lêkolînên arkeolojîk ên li wê deverê de, ku di sala 1992"an de dest pê kiribûn, hate keşifkirin. Di navbera salên 240 BZ û 4200 BZ de gelek şaristanî ji vî girî derbas bûne û di nav van şaristaniyan de yên Akadî, Asûrî, Helmandî, Parîsî û Mîtanî jî hene. Çar perestgeh û meydaneke pîrozbahiyê li aliyê başûr cih digre û her wiha bircêk cerdevaniyê ku bi qasî 6 an 7 metreyan bilind bû, dihewîne. Ji bilî depoyan, bazarek jî hebû ku bazirgan lê dicivin.



**Vedîtinên arkeolojîk ên herî girîng ên li qadê:**

Vedîtinên mîmarî: Bajarê jorîn, bajarê jêrîn, qesr, perestgeh, dîwar û derî.

Vedîtina duyemîn tableta ji axê ya herî kevin piştî tablêta ji cihê arkeolojîk ê Eblayê, ku hejmara tabletan gihîştiye 216 tabletan, ku hejmareke piçûk ji wan in; Lê ew behsa jiyana di hezarsala sêyem a berî zayînê de dike, wekî ku piraniya hejmarên ku li deverên din ên li Sûriyeyê hatine keşifkirin behsa jiyana di hezarsala duyem a berî zayînê de dikin.

- Vedîtina gelek mohrên istiwanî bi nexşe û şeklên xwezayî.
- Dîtinên arkeolojîk ên li wê deverê hatine dîtin, kêm in, ji bilî berhemên seramîk, di nav van dîtinan de bûkên ji heriyê hebûn ku fîgurên mirovan temsîl dikirin, ku piraniya wan jinan bûn, yên din ên bi şiklê lawiran, Ji bilî morîk û gerdaniyên ji kevir, qalik hatine çêkirin.

Bi saya lêkolînên arkeolojîk, gengaz bû ku di van serdemên dîrokî de, ku ji dora 4300 BZ heta 240 BZ dirêj dibin, demên niştecihbûna mirovan li wir werin destnîşankirin.

# ‘Parastina Jîngehê parastina jiyanê ye’

**Endama Beşa Lêkolîn û Plangeriyê ya Desteya Jîngehê ya Kantona Cizîrê Maya Miswer diyar kir ku xebatên wan ji bo parastina jîngehê di asteke baş de têne meşandin û wiha got: “Em her sal zêdebûna deverên kesk, daran, parastina parastgehan wek proje digrin dest, ji ber ku parastina jîngehê parastina jiyanê ye."**

**Diyala Nîdal\Qamişlo**

Bi armanca xemilandin û duristkirina avhewaya herêmê Desteya Jîngehê di 7`ê Tîrmeha sala 2023`an de li bajarê Qamişlo hate avakirin. Herwiha Desteya Jîngehê ji destpêka avabûna xwe ve û heta roja îro kar û xebatên xwe dide meşandin.

Di derbarê piroje, kar û xebatên Desteya Jîngehê Endama Beşa Lêkolîn û Pilanameyê Maya Misewer ji Rojnameya me re axivî.

### Kar û xebatên jîngehê

Maya Misewer di destpêka axaftina xwe de wiha got: “Desteya Jîngehê di destpêkê de girêdayê Desteya Şûnwaran bû, piştî demekê bû girêdayî Desteya Tendûristiyê, herwiha piştî wê bû girîdayî Desteya Şaredariyan. Lê piştî ku kar û xebatên Desteya Jîngehê ji milê Rêveberiya Xweser ve li ber çavan hate girtin, pêwîstî hate dîtin ku



Desteya Jîngehê bibe desteyek serbixwe û xebatên wê bên berfirehkirin. Destpêkê karê Desteya Jîngehê şopandina milê qanûnî û hemû kar û xebatên çandina daran û şitilgihan bû, lê kar ne zêde berfireh bû û tu giraniya wê nebû. Lê mîna gava destpêkê karekî baş û serkeftî bû. Lê di dema dawiyê de û piştî ku karê jîngehê ji karê şaredariyan cuda bû, zagon û rêziknameya taybet a girêdayî jîngehî hate danîn. Desteya jîngehê jî li ser asta Bakur û Rojhilatê sûriyê hate avakirin û li herêman jî weke desteyên cuda jî hatin avakirin. Niha divê demê de kar û xebatê Desteya Jîngehê ji bo parastina jîngehê di asteke baş de tên meşandin.”

### ‘Armanca me xemilandina bajêr bi keskahiyê ye’

Maya Miswer da zanîn ku ew her sal zêdebûna deverên kesk, daran, parastina parastgihan wek piroje digrin dest û wiha berdewam kir: “Weke tê zanîn em her sal zêdebûna deverên kesek weke piroje digirin dest, herwiha armanca me ya sereke xemlandina bajêr bi keskahiyê ye. Di heman demê de paqijiya jîngehê paqjiya mirovahiyê ji ber vê yekê pêwîst e ku her kes parastina paqijya jîngehê bike. Lê weke ku em dibînin di nava civaka me de çanda paqijiyê kêm e, dema ku em daran li cihekî diçînin ji bo ku avhewaya herêmê xweş bibe, lê welatî parastina wan daran nakin. Astengiyên ku em di karê xwe de dibînin ji ber rewşa herêmê ye û dema ku dewleta Tirk a dagirker êriş dike em nikarin karê xwe bikin. Ev yek dibe astengiyeke mezin li pêşiya karê me.”

### Pirojeyên dema pêş yên Desteya Jîngehê

Maya Misewer anî ziman ku wan îsal gelek parastgehên herêmê berferkirin û wiha pê de çû: “Me îsal gundê Navkurê ya bajarê Qamişlo kire parestgeheke xwezayî û me paqij kir, ji ber ku gelek qirêj li wir hebû û heta roja îro em li ser kar dikin. Bi hemhengiya rêxistinan em daran li herêmê diçînin, herwiha me li ser riyan gelek çopdankan danîn e ji bo ku welatî hewîrdorê qirêj nekin. Di heman demê de sala 2024`an pirojeyên me tune bûn, ji ber ku rewşa herêmê ne baş bû. Lê îsal pirojeyên me hebûn û me gelek dar li herêmê çandin. Herwiha ji bo demên pêş sê pirojeyên me hene ew jî pêşketina taqîgehê ye û şitilgiha Barîn jî em ê bikin şitilgikeke mezin di kantona cizîrê de. Herwiha em ê hemehengiyê bi Zanîngeha Rojava û şaredariyê re bikin, ji bo ku em parkekê bi hejimara şehîdan li bajarê Qamişlo çêkin. Lê ne tenê li bajarê Qamişlo em ê li tevahiya bajarên kantona Cezîrê parkan bi vî rengî çêkin.”

### ‘Pêwîst e em xwedî li keda xwe derkevin’

Endama Beşa Lêkolîn û Pilanameyan Maya Miswer axaftina xwe wiha bi dawî kir: “Banga min ew ku gelê bi me re alîkarbe û parastina jîngehê bikin, ji ber ku paqjiya jîngehê girêdayî derûnî û tendurstiya mirov e. Herwiha hêviya min ew e ku em rolekî baş bilîzin di xemilandin û paqijiya bajarên xwe de. Çawe ku bav û kalên me beriya sedê salan li vir jiyan dikirin û di nava şînkahiyê de bûn. Pêwîst e ku em jî xwedî li ked û xwîdana wan derkevin û jîngeha xwe biparêzin, herwiha welatê xwe xweş û bi xemilînin.”

# Paqijî bi hevakariya civak û şaredariyê çêdibe

**Ronaz Silêman/Qamişlo**

**Hevserokê Şaredariya bajarê Qamişlo Istêfo Mesûd diyar kir ku paqijiya bajar bi hevkariya di navbera civak û şaredariyê de pêkan dibe û got, “Paqijî asta pêşketina gelan diyar dike.”**

Parastina paqijiya bajêr erka her kesî ye. Paqijî exlaq û çanda civakê ye. Çawa ku welatî parastina paqijiya malên xwe dikin, divê di heman demê de parastina paqijiya kolanên bajarê xwe jî bikin. Çendîn şaredarî paqijiyê li xwe bigire, ancax bi hevkariya bi gel re çêbibe. Berovajî wê jî, dewamkirina diyardeya avêtina çopê. Paqijî ji îmanê ye.

### Pênaseya paqijiyê

Paqijî çand û şêwazeke jiyanê ye ku em bi rêya komek kevneşopiyên saxlem ên ku em rojane pêk tînin digirin, da ku tenduristiya xwe wekî takekesan û ewlehiya jîngeha li derdora misoger bikin.

Parastina paqijiya jîngeh û derdora me ji çend aliyan ve pêk tê. Ji perspektîfa mirovan e ku divê her ferde vê civakê hewl bide ku jîngehek paqij û bê qirêjî ava bike. Hevkarî û dilsoziya kesan bi jîngeha xwe re, hewaya paqij, axa çandiniyê û ava vexwarinê tê bidestxistin. Divê her kes xwe ji bîr nekin û kesên derdora xwe bi qirêjiya bajêr û jîngehê sûcdar nekin. Bi hev re, em dikarin jîngeha xwe biparêzin û bi erkên xwe yên li hember wê rabin û nepirsin ka kî berpirsiyar e. Eger her kes dora mala xwe paqij bikira, wê her bajar paqij bimaya. Paqijî xweşik e, lê çiqas mezin e gava ew di hişê me de be. Jiyana te bi qîmet e, wê qirêj neke û nexe xetereyê.

### Divê rêz ji keda xebatkarên paqijiyê re were girtin

Pêwîste keda xebatkarên paqijiyê yên ku paqijiya welat û bajarê me bê westandin diparêzin, ji bona her kesî, cihê rêzgirtinê be.

### Girîngiya paqijiyê

Paqijî yek ji wan hêmanên herî girîng û stûnên jiyanê ye ku ji bo mirovan pir pêwîst e. Ew tê wateya parastina tenduristiya laş, giyan û jîngehê ji ax, mîkrob û nexweşiyan. Paqijî kesayetî, tevger û cihê mirov di civakê de nîşan dide. Her kes rêzê ji mirovê paqij re nîşan dide û cihê bawerî û qîmetê ye. Xwe rihet, bextewar û ji xwe bawer hîs dike.



Derbarê kar û xebatên paqijiyê li bajarê Qamişlo, hevserokê Şaredariya Gel a bajar Istêfo Mesûd ji Rojnameya me re axivî.

### ‘Her kes xwe berpirsyarê paqijiyê nabîn e’

Istêfo Mesûd diyar kir ku rojane paqijî li bajêr tê kirin û wiha got: “Li bajêr her roj ji sibehê ve xebatên paqijiyê ji aliyê karmendên paqijiyê ve tê destpêkirin û tax bi tax qirêjî tê rakirin, li kêlek wê jî bazar rojane û bi taybet riyên sereke yên ku çûn û hatina wê zêde ye tên paqijkirin. Li taxan jî erebe ji heftiyê zêdeyî 5 caran digerin û qirêjiya di çopgehan de radikin. Xebatên paqjiyê jî li ser beşê sibehê û piştî nîvro tê dabeşkirin. Lê tevî xebatên rojane jî, hîna pirsgirêka paqijiya bajêr berdewam e, ji ber ku em hîna negihane asta ku her kes xwe berpirsyarê paqijya kolan û derdora xwe bibîne, lewra gelek zehmetî di vî warî tên kişandin, ev ji derveyî ku bajar mezin e û xebatekî mezin jêr pêwist e”.

### ‘Barê xebatkarên paqijiyê bi belavbûna çanda paqijiyê sivik dibe’

Mesûd da zanîn ku bi têghiştina çanda paqijiyê re barê giran ê li ser xebatkarên paqijiyê tê rakirin û wiha dewam kir: “Her çiqas çanda paqijyê bê belavkirin ewqas barê giran li ser xebatkarên paqjiyê sivik dibe û qirêjî ji holê radibe. Tevî ku çopgeh li hemû taxan hatine danîn, lê hîn jî hinek hene çopê derdorê belav dikin, di heman demê de demên hatina erebeya paqijiyê diyar e, lê xwe pabendê wê yekê nabînin. Ji ber ku hîna jî çanda paqijiyê di nava civakê de hîna kêm e”.

### ‘Rojane 300 ton qirêjî ji bajêr derdikeve’

Mesûd eşkere kir ku rojane nêzî 300 ton qirêjî ji bajêr derdikeve û wiha anî ziman: “Rojane nêzî 300 ton qirêjî ji bajarên mezin derdikeve. otombêlên kar bi hemû hêza xwe dixebitin. Em jî her di nava hewldana belavkirina çanda paqijiyê de ne ku civak alîkariya me neke, paqijî pêk nayê”.

### Mekanîzmeya kar

Mesûd diyar kir ku li bajarê Qamişlo nêzî 250 karkerên paqijiyê hene û ev tişt zêde kir: “33’ê alavên veguhestina qirêjiyê li bajarê Qamişlo hene, ew jî çap, terktor û hawiyatê çopê ne. Her wiha nêzî 250 karkerên paqijiyê hene, ev aliyat jî her roj 16 seatan kar dikin. Dema pirsgirêk bi aliyatan re çêdibin, ew jî dibe zehmetî, li pêşiya xebatên paqijiyê. Civîn ji bo mijara paqijyê ji gel û meclisên bajêr re tên çêkirin, di van civînan de hişyarî li ser çanda paqjiyê tê kirin”.

### ‘Paqijiya bajar ji pêşketina gel e’

Istêfo Mesûd axaftina xwe wiha qedand: “Paqijiya bajar ji pêşketina gel dest pê dike, berpirsyartî ne tenê ya şaredariyê ye, berovajî wê divê gel jî bi me re alîkar be, bi diyarkirina dema avêtina çopê pabend bin û çopê di cihê diyarkirî de bavêjin, ji bo qirêjî li derdora çopgehê belav nebe”.



# Partiyên Rojavayê Kurdistanê: Rêber Apo heqîqeteke gerdûnî ye

**Endamên partî û dezhegên siyasî yên Rojavayê Kurdistanê dan diyarkirin ku tevî hemû hewildanên Rêber Apo yên ji bona çareseriyê hîn dewleta Tirk gavên erênî ne avêtine û gotin: “Ji bona yekrêzîya Kurd û aramiya herêmê pêwîst e Rêber Apo demildest bê azad kirin"**

**Argêş Vîyan/Qamişlo**

Ev ked û meşa Rêber Apo ya azadiyê, ev meşa Rêber Apo ya heq, hiqûq, edalet û wekheviyê bi hemû awayî xet hizmeta civak û gelan. Ev yek hişt ku her kes vê rojê wekî roja xwe bibîne. Ji ber ku raman û felsefeya Rêber Apo ji xwe re wekî rênîşander dibînin, wekî zanebûnê dibînin. Çareserkirina hemû nakokiyên heyî di nava ramanên Rêber Apo de dibînin û ev jî heqîqet û rastiyek e.

Di derbarê azadiya fizîkî ya Rêber Apo û rola wî ya giring ya proseya aramî ya herêmê de, endam û berpirsên partiyên sîyasî yên Rojavayê Kurdistanê Ilham Mihemed, Feysel Yûsif, Midya Eko û Muhyedîn Şêx Aalî ji rojnameya me re axivîn.

### ‘Azadiya Rêber Apo, azadiya hemû gelên azadîxwaz e’

Endama nivîsgeha karên derve ya PYD Ilham Mihemed da diyarkirin ku Rêber Apo rêberê gerdûniye û wiha dest bi axaftina xwe kir: “Di dîrokê de heya niha planên li ser gelê Kurd tê kirin, hemû li ser qirkirin û tinekirina gelê Kurd e. Sedema yekemîn ew e ku Rêber Apo û Tevgera Azadiyê hemberî wê têkoşîn kir û dîl hat girtin. Ji ber ku Rêber Apo hertim alîgirê demokrasî û çareseriyê ye. Ew ne cara yekemîn e ku Rêber Apo banga azadî û demokrasîyê dike. Mirov tenê bi banga Rêber Apo ya 27’ê Sibatê re hîn tiştan sînordar bihêle, rastiya tê jiyan kirin de divê pênaseya wê têrker nebe. 1993’an heyanî roja me ya îro Rêber Apo gelek caran ew hewildanên ji bona aramî û çareseriya pirsgirika Kurd dan nîşandan û hêmanekê sereke yê aşitî û çareseriyê Rêber Apo ye. Rêber Apo bi pêşengiya gelek qehreman û pakrewanan şerê çekdarî da destpêkirin û têkoşîn gehişte armanca xwe. Lê mixabin dewleta Tirk ya dagirker hertim ev hewildanên Rêber Apo vala derxist û pêşiya çareseriyê bû asteng. Dewleta Tirk hertim bû alîgirê şer û pevçûnan. 27’ê Sibatê piştî bangeweziya Rêber Apo û lidarxistina kongireya PKK jî, hîna jî ti gavên berbiçan ne hatine avêtin. Hertim hewildidan ku proseyên Rêber Apo yên çareserî û demokrasiyê vala derbixin û têkbibin. Ji ber wê jî heya niha jî, Rêber Apo dîlhatiye girtin û tecrîd berdewam dik e. Dijminên gelê Kurd çiqasî hewildan kirin ku Kurd û gelên herêmê yên azadî xwaz têkbibin, berovajî



Ilham Mihemed


wê Rêber Apo hertim kar, xebat û hewildanên wî ji bona aştiyê bû. Rêber Apo bi ramanên xwe bûye serokê gerdûnî. Hemû gel û pêkhateyên herêmê Rêber Apo weke vîn û rêberê xwe dibînin û dipejirînin. Ev pêvajoya ji bona gelê Tirk û hemû gelên ku di Tirkiyê de jiyan dikin jî pir giring e. Ji bona ev pêvajo bimeşe pêwîste ku astengiyên li pêşiya Rêber Apo rabin, tecrîda li ser Rêber Apo bê rakirin û azadiya Rêber Apo bê mîsogerkirin.”

### ‘PKK bersiv da banga Rêber Apo û neha dora dewleta tirk e, ’

Ilham Mihemed got ku azadiya Rêber Apo ji bona rêvebirina pêvajoya tê meşandin pêngavekî dîrokî ye û wiha qedand: “Li gorî banga Rêber Apo ya 27’ê Sibata 2025’an de kongireya xwe ya 12’emîn lidarxist. Biryarên girîng û bi wate di kongireya dîrokî de hatin girtin. Tevî hemû zext û êrîşan ger ku Tevgera Azadiyê kongira xwe lidarxistibe, ev nîşaneya israra tevgerê ji bona pêkanîna aştî û civaka demukratîk e. Divê dewleta Tirk demildest gav bavêje û azadiya fizîkî ya Rêber Apo mîsoger bib e. Ezmûna 52 salan ya PKK’ê da xuyakirin ku Kurd û gelên azadîxwaz ji mirinê natirsin û wê têkoşîna mayinde bimeşînin. PKK û Rêber Apo Kurd ji tinekirinê xêlaskirin û bi tevahî cîhanê rastiya kurdan . Divê gelê Kurd ji her demê zêdetir xwedî li Rêber Apo û Tevgera Azadiyê derbikeve û destkeftiyên xwe biparêze. Dîsa li ser wê bingehê em silavên xwe yên germ ji Rojavayê Kurdistanê, heya Imraliyê ji rêberê mirovahiyê Rêber Apo re dişînin.”

### ‘Çareseiya pirsgirêka kurd li bakurdê kurdistanê wê bandorê li tevahiya beşên din bike ’

Endama Meclîsa partiya Pêşverû ya Kurdên Sûriyê Midya Eko anî ser ziman ku ji ber ku Bakurê Kurdistanê beşê herî mezine û pêşketinên li wir dê bandora



Midya Iko

xwe li tevahî Kurdistanê bike û wiha berdewam kir: “Di 15’ê Sibata 1999’an de bi kompoloyekê Rêber Apo hat dîlgirtin. Ew jî di nav Kurdên tevahî cîhanê de bû cihê nerazîbûn ê. Bandora dîlgirtina Rêber Apo li ser pirsgirika Kurd jî pir çêbû. Li ser asta herêmî û cîhanî jî ev yek dihat xûyakirin. Em weke partiyên Kurdî piştgirî û piştevaniya xwe ji bona azadiya Rêber Apo ya fizîkî didin xuyakirin. Heya serkeftinê em ê erkê xwe pêkbînin. Banga Rêber Apo û pêvajoya ku daye destpêkirin dîrokî ye û pewîste aliyên peywendîdar yên din jî gavên erênî bavêjin. Çek û hêza me xurtbûna xebat û karê me yê ku em dimeşînîn, têkoşîna 52 salan ev xurtbûn û berxwedanî da pêşîyam e. Em xurtkirin û divê şêwazê têkoşînê bê guherandin. Ev banga Rêber Apo ji bona çareseriya pirsgrika Kurd bi riya demokrasîyê bû hêz û piştgirî ji bona tevahî Kurdistan ê. Ger îro mafê gelê Kurd li Tirkiyê û Bakurê Kurdistanê mîsoger bibe û bandorê li tevahiya beşên din jî bike. Em jî weke aliyekê Kurd û siyasetmedarekê hêvîdarim ku demildest Rêber Abddullah Ocalan bê berdan û aramî û demokrasî li Kurdistan û Rojhilata Navîn pêkwere.”

### ‘Em weke ENKS wê bangê piroz dibînin, divê azadiya Rêber Apo mîsoger bib e’

Berdevkê Encûmena Niştimanî ya Kurd li Sûriyê (ENKS) Feysel Yûsif, Rêber Apo bingehekê mezine ji bona çareseriya pirsgirika Kurd û wiha got: “Me ji berê de jî weke ENKS’ê daxuyanî da û me got ku em piştgirî didin banga Rêber Apo û gavekê pîroz û di cih day e. Ev serdemeke mezine ji bona yekbûyin û yekîtiya gelê Bakurê Kurdistan ê ye. Bi rastî jî gelek deskeftiyên me li Bakurê Kurdistanê jî hene. Weke şaredarî, parlementerî û hwd. divê ev deskeftî bên parastin. Aliyekê din jî taybet Bakurê Kurdistanê û pêve girêdayi li her çar aliyên welat jî banga Rêber Abdullah Ocalan bandora xwe kir. Rêber



Feysel Yûsif

Abdullah Ocalan yek ji bingehîn rola wî çareseriya pirsgirêkên Kurd û heremê ye. Îro jî bûyer û geşedanên Bakurê Kurdistanê dê bandora xwe li hemû beşên Kurdistanê bik e, ji ber ku pêwîstiya gel û civaka Kurd bi aramîyê hey e. Gelek pêşeng û xebatkarên Kurdistanî çêbûne, êdî em bûne hêzeke sereke li her derê cîhanê. Li Tirkiyê opozisyon û deshilat jî hewcedarî dengê Kurd û Kurdistanî ne. Ji ber wê demildest pêwîste bersiva Banga 27’ê Sibatê ji aliyê Rêber Abdullah Ocalan ve hatî dayin bidin, di serî de girtiyên sîyasî werin berdan û her wiha mafên bingehîn yên Kurdan bixin meriyetê de. Banga me ji bona partiyên Kurdî yên li parlementa Tirkiyê da siyasetê dikin, di serî de DEM Partî û di heman demê de partiyên din divê zext li parlementoyê bikin û azadiya Rêber Abdullah Ocalan bi dest bixin. Pêwîste destûra Tirkiyê de êdî navê Kurdan hebe û hikûmeta Tirkiyê jî gavên berbiçav bavêje. Ji ber ku Bakurê Kurdistanê yek ji wan beşê herî mezin yê Kurdistanê ye, dê bandora rûdanên ku li wir çêdibin, li hemû beşan bik e.”

### Ji bona çareseriyê pêwîste dewlet gavên berbiçav bavêje

Feysel Yûsif da xuyakirin ku ji avakirina Komara Tirk heya niha pirsgrêk û alozîyên gelên ji derveyî Tirkiyê tên jiyan kirin û wiha axaftina xwe bilêv kir: “di dema damezirandina Komara Tirkiyê de pirsgrika bingehîn pirsgrika azadiya gelan e. Ji ber hişmendiya avakirina komarê bi berdewamiya Osmanî û nijadprestiya Tirk ve dewam kir. Ji ber vê yekê ye ku ji bilî Tirkan ti gelê din maf ji wan re nehatiye hiştin û qebûl kirin. Hin aliyên demokrasîxwaz yên Tirk jî ji derve tên hiştin. Divê dest ji wê siyaseta qirkirinê bê berdan. Ji bona wê yekê jî pewîste di serî de Rêber Apo û hemû girtiyên siyasî bên berdan. Lidarxistina kongre PKK’ê û banga aşitî û civaka demokratîk pir erênî ye û em piştgirî didin wê pêvajoyê. Ger ev pêvajo serkeftî bibe dê



Muhyedîn Şêx Alî

bandora xwe li ser her çar beşênn Kurdistanê jî bik e. Em dîsa bang li dewleta Tirk dikin gavên berbiçav divê were avêtin.”

### ‘Keda Rêberê gelan Rêber Apo bi wate û pîroz e’

Sekreterê Partiya Yekîtî ya Demokrat a Kurd li Sûriyê Mihyedîn Şêx Aalî da diyarkirin ku rola Rêber Apo ya ji bona çareserî û aramiya heremê rolekê girîng û watedar e, û wiha got: “Di 26 salên derbasbûyî de piştî girtina Abdullah Ocalan û tecrîdkirina wî ya li Girtîgeha Girava Îmraliyê, kampanyayên piştevaniyê yên ji bo azadiya wî berdewam dikin. Di van kampanyayan de bi milyonan Kurd û gelek dost û piştgirên mafên mirovan ji gel û welatên curbicur ên cîhanê, gelek kesatiyên navneteweyî, akademîsyen û parlementer, rol û çalakiyên Dadgeha Mafên Mirovan a Ewropayê û koma berevaniyê ya rêberê nemir yê Afrîkî Nelson Mandela jî hebûn. Bangên aştiyane yên Rêber Apo zêdetir ji carekê hatine dubarekirin, ku ya herî dawî banga wî ya navdar di 27’ê Sibatê de bû, ku bi tundî daxwaza redkirina tundî û çekan û bi zimanê aşitî û diyalogê di çareserkirina pirsgirêk û nakokiyan de bê dudilî kir. Ev bangewaziya dîrokî ji aliyê piraniya hêzên siyasî û çandî û elîtên ku xema pirsgirêka aştî û aramiyê li Tirkiyê û derdora wê dikin, bi armanca vekirina rûpeleke nû ya hevkariyê ku navê wê dostanî û biratiya gelên herêmê ye, ji bo dabînkirina parastina jiyana hevbeş û rêzgirtina mafên wan ên azadî û wekheviyê, hat qebûlkirin û pêşwazîkirin. Civîna serketî ya Kongreya 12. ya Partiya Karkerên Kurdistanê (PKK) di 5-7’ê Gulanê de, li ser banga rêber Apo, ji bo pêşketin û geşepêdana pêvajoyeke siyasî ya xwedî pîvanên dîrokî, faktoreke erênî û hêzeke bihêz e. Girîng e ku hewildanên hevgirtî ji bo dabînkirina berdewamî û berdewamiya wê ber bi encamên wê yên tê xwestin de bêne kirin, da ku her kes bikaribe jiyanek bi rûmet û paşerojek ewledar û bextewar be.”

# ‘Aştiya civakî xeyalê Sirri Sûreyya Onder yê mezin bû’

**Hevserokê şarederiya bajarê mezin ê Mêrdînê Ahmet Turk xuya kir ku Sirri Sûreyya Onder fedayê aştiyê bû û wiha got: “Bi eslê xwe Tirk bû, lê di kesayeta xwe de ew mirovekî sosyalîst, demokrat û şoreşgerekî enternasyonalîst bû."**

**Zindan Şoreş/Qamişlo**

Parlamenterê Stenbolê yê Partiya Wekhevî û Demokrasiya Gelan (DEM) û Cîgirê Serokê Meclîsa Neteweyî ya Tirkiyê (TBMM) Sirri Sûreyya Onder piştî krîza dil, roja Şemiyê 3’ê Gulanê li beşa lênêrîna giran a nexweşxaneyê koça dawî kir.

Di derbarî serpêhatî û jiyana parlementer û yek ji endamên desteya grava Imraliyê 3’ê Gulana 2025’an koça dawî kir ya Sirri Sûreyya Onder de, rêhevalê wî û Hevserokê şarederiya bajarê mezin ê Mêrdînê Ahmet Turk pirsên rojnameya me bersivandin û naverok wisa bû:

**1- Weke tê zanîn parlemeter û şoreşger Sirri Sûreyya Onder 3’ê Gulana 2025’an koça dawî kir. Hûn wek hevalekî wî yê nêzîk dikarin kurtejiyana wî bi me re vebêjin?**

Bi rastî gelekî zehmete ku mirov behsa Sirri Sûreyya Onder bike. Lewre ew kesayeta wî, nêrîna wî



ya cîhanî, nêzîkatiya wî ya mirov û xwezayê zehmete ku mirov bîne ziman. Lê dîsa jî em xwe deyndarê keda wî dibînin û bi qasî ku zimanê me bigere emê çend tiştan derbarî wî de bêjin.

Sirri Sûreyya Onder ji Semsûr bû. Bi eslê xwe Tirk bû lê di kesayeta xwe de ew mirovekî sosyalîst, demokrat û şoreşgerekî enternasyonalîst bû. Lewma jî di têkoşîna azadiya gelê Kurd de cihê xwe digirt. Dibe ku gelek kesan wî wekî siyasetmedar dinasî lê nasnameyeke wî ya pir rengî hebû. Kekê Sirri derhêner, senarîst, çêkerê fîlman, lîstikvan, rojnamevan û siyasetmedarekî hêja bû. Parlamenterê DEM Partiyê yê Stenbolê û Alîkarê Serokê Meclîsa Mezin a Tirkiyeyê (TBMM) bû. Di çapemeniya neteweyî de wekî derhêner, senarîst, lîstikvan, hilberînerê muzîkê û qunciknivîskar xebitî. Di bingeha xwe de jiyan û têkoşîna wî li ser pêşxistina sosyalîzmê bû. Di wê çarçoveyê de pêşxistina demokrasî, wekhevî û aştiya civakê ji xwe re esas digirt. Ev xeyal û hezkirineke wî ya pir mezin bû.

**2- Mirov çawa dikare hewildanên wî yên çareserî û demokrasiyê binirxîne?**

Ji ber kesayeta wî ya sosyalîst û demokrat wî her tim ji bo gelên bindest li çareseriyekê digeriya. Beriya siyasetê di fîlmên xwe yên ku çêdikir de, di nivîsên xwe yên di rojnameyên wekî Bîr Gun, Radîkal û Ozgur Gundemê de bi awayekî aşkera dida xuyakirin. Tenê ne di fikir û raman de di partîk û bi emelê xwe ev yek dikir. Têkoşîna azadî û aştiyê dida. Dixwast gelê Kurd jî wekî hemû gelên din bi mafê xwe bijîn. Zilm û zora dewletê ya li ser gelê Kurd baş didît û qebûl nedikir. Mirov dikare bêje ku ji Kurdekî pirtir ji bo mafê Kurdan têdikoşiya.

**3- Tevlîbûn û rola wî ya şandeya Imraliyê weke kesekî çalak hûn dikarin bêjin?**

Beriya ku ez behsa rista wî ya di Şandeya Îmraliyê de bikim, dixwazim hinekî behsa tevlibûna wî ya siyasetê bikim. Kekê Sirri di hilbijartinên giştî yên sala 2011’an de, ku ji aliyê Bloka Ked,




Demokrasî û Azadiyê (serbixweyên bi piştgiriya BDP’ê) ve ket hilbijartinê û ji herêma 2’yemîn a Stenbolê wekî parlamenter hat hilbijartin. Armanca wî ya tevlibûna siyasetê ew bû ku ji bo aştî, wekhevî û demokrasiyê kedekê bide û bigihîne qonaxekê. Ji ber kesayeta wî ya bi nirx di pêvajoya hevdîtinên diyalok û çareseriyê de ew jî tevli Şandeya Îmraliyê a pêvajoya 2013-2015an bû. Wê demê jî risteke girîng lîst. Ji xwe piştî mutabaqada Dolmabahçeyê ya di 28’ê Sibata 2015’an de êdî li Tirkiyeyê rewş guherî. Pişt re jî operasyonên qirkirinê dest pê kirin. Ji ber xebatên xwe yên wê pêvajoyê jî Sirri hat girtin 43 mehan di zindanê de ma. Lê wî dev ji têkoşîna xwe berneda û bi awayekî çalak dîsa di nav siyasetê de cihê xwe girt. Di hilbijartinên giştî yên Tirkiyeyê yên sala 2023’yan de ji Partiya DEMê wek parlamenterê Stenbolê hat hilbijartin. Belê ji ber çalakbûna wî, kar û xebatên wî, her wiha tecrubeyên wî û kesayeta wî ya ku dikarîbû bi her kesî re danûstendinê bike careke din di nav şandeya Îmraliyê de cih girt. Bi rastî jî ew ji bo pêvajoyeke wiha û meşandina karekî wiha pîroz kesekî bêhempa bû. Me bi hev re jî kar û xebat kir. Ew ji bo vê pêvajoyê gelekî bi hêvî bû. Wî hemû bala xwe dabû ser vê pêvajoyê ku çawa bi serkeftî encam bike. Ji bo wî ya harî girîng pêkhatina aştiyeke bi rûmet bû. Wî tu carî bêrûmetî qebûl nekiribû û dixwest gelê Kurd jî bi aştî û rûmet bigihêje hemû mafên xwe. Ji bo wê jî çi ji destên wî dihat dikir. Heta ku li tenduristiya xwe jî piştguh kiribû û taloqî piştî aştiyê kiribû. Ev bi rastî ne karê her kesî ye. Encax kesekî mîna Sirri Sûreyya Onder dikaribe bike.

**4- Weke tê zanîn li kêleka hemû alî û derdoran, Rêberê gelan Rêber Abdullah Ocalan jî peyama sersaxiyê weşand. Hûn çawa dinirxînin?**

Mirina birayê Sirri Sûrreya Onder ji bo her kesî êşeke mezin bû. Ji bo gelê Kurd û gele Tirk êş û windahiyeke mezin bû. Ji bo Kurdistan û Tirkiyeyê windahiyeke mezin bû. Ji bo aştî û demokrasiyê windahiyeke mezin bû. Ji bo pêvajoya aştiyê ya li Tirkiye û Kurdistanê windahiyeke mezin bû. Ev windahî dilê her kesî êşand. Bi taybetî jî mirov dikare bêje ji bo birêz Abdullah Ocalan jî êş û windahiyeke mezin bû. Lew re yek kesê ku di karê xwe de serkeftî, ji bo aştiyê dixebitî û birêz Ocalan baş fêhm dikir Sirri Sûreyya Onder bû. Ji lewma jî Rêber Abdullah Ocalan peyamek şandibû û di merasîmê de hate xwendin.

Rêber Abdullah Ocalan di peyama xwe de digot, “Bi wefata Sirri Sûreyya Onder ê xoşewîst xemgîniyek kûr ket ser dilê me. Mirovekî pir bi qîmet bû. Ewladekî rasteqîn ê gelan bû. Kevneşopiya Anatoliyê û Turkmenan ewladekî xwe yê mezin winda kir. Hemû civakên erdnîgariya me û gelê me rêhevalekî xwe yê mezin winda kir. Ez rêzdariyek mezin nîşanî bîranîna wî dikim”. Di vê peyama xwe de birêz Ocalan kesayeta Sirri Sûreyya Onder bi zelalî radixist ber çavan û dida xuyakirin ku li ser navê jiyana aştiyane ya bi hev re ked û jêhatibûnek wî ya mezin hebû. Mirov dikare bêje keda wî ji bo aştiyê pir bû. Aştiya civakê xeyalê wî yê mezin bû. Em jî hêvî dikin ku ew xeyalê wî nîvco nemîne û bi aştiyeke birûmet tacîdar bibe.



## Şoreş, li Rojhilat ketiye rojevê

**Ahmet Aktaş**

Di vê pêvajoya dudan de şoreş, li Rojhilatê Kurdistanê germ dibe û biser dikeve.

Ev dîtin, ne ji daxwaziyek hestiyarî tê, belê ji konjoktora Rojhilata Navîn û ya cihanî tê.

Heke di çarçova şerê sisya yê cîhanê de em bala xwe bidinê, ji bo pêşketin û bandora Çînê û Rûsyayê bide rawestandin, divê kelemê mezin rejîma Îranê were hilweşandin. Ji bo di vê stratejiya xwe ya cîhanî de bi serkeve DYEyê, li derdorê Îranê; li gel meşandina lezgîn a diplomasî û hewldanên berfireh, pir caran êrîşên dijwar jî pêktîne.

Li aliyekî, bi navê Hevpeymanên Brahîmî hemû dewletên Ereban li rex Îsrailê rêz dike û dicivîne. Li aliyê din cenga Ukrayneyê dide rawestandin, lê berevajî, êrîşên malxerabkirinê dibe ser hêzên alîgirên Îranê; jixwe rejima Baasa Esed hilweşand, derbên mirinê yên mezin li Hemasê, Heşdî Şabî û Hizbullaha Libnanê da, heman êrîşên li ser Hûsiyên Yemenê û hwd. dewam dikin. Trump jî, derketiye gera xwe ya derve ya yekê û gera wî ya li herêmê 4 rojan(13 û 16’ê vê mehê) dewam dike.

Di vê qada hevpeymandarên Brahîmiyan de, li sê welatan; Siûdî Erebistan, Qeter û Begîtiya Yekbûyiya Ereban digere. Di gera xwe ya roja yekê de, li Siûdiyê; Trump, Receb Erdogan jî, bi rêya onlynê beşdarî civîna xwe ya li gel Mihemmed Bin Selman û Ahmet Şara kir.

Receb Erdogan, vê bûyerê weke serkeftinek mezin nîşan dide û di çapemeniya xwe de, pesnê Trump dide. Ji ber ku Trump, vê nexweşiya pesindariyê ya Receb nas dike, vê carê jî dubare pesnê wî dide. Lê weke li jor hat gotin, di vê gerê de armanca Trump, bingehîn bi destxistina berjewendên aboriya dewleta xwe ye û misogerkirina ewlehiya Israîlê ye.

Her wiha di pêvajoya çareseriyê ya nû de jî, berjewendê dewleta xwe dibîne û lewma li dij dernakeve.

Ji ber ku di eniya dijî Îranê de, Tevgera Azadiyê, ji her alî zêdetir objektîf, xwedî hêz, xwedî îrade, jixwe bawer, xurtir û hemdemî dibîne.

Kurt kurmancî di vê serdema şerê 3an ê cîhanî de her alî; biçûk an mezin hewcedarî hevdû ne, lê ji Tevgera Azadiyê pirtir, hêzên herî mezin herî pirtir hewcedarî hêzek wek hêza Tevgera Azadiyê ne. Lewma, heke îro wisa nerm nêzî Tevgera Azadiyê dibin, ne ji bo “çavên reşbelek e”, belê ji ber şert û mercên objektîf in û ji ber hewcedariya zêde ya wan e.

Di vê pêvajoya dudan de, xwedîderketina li bang û pêşengtiya Rêber APO, ji pêvajoya yekê pirtir bû. Vê carê, him li hundur Yekîtiya Netewî him xurtir pêkhat, him li derve di qada navnetewayî de destek û piştgirî ji cara yekê xurtir e. Lewma mirov dikare hêsantir pêşbînî bike ku vê carê dora şoreşa Rojhilatê Kurdistanê ye. Di encamê de li gel Rojava û Başûr, vê carê bi şoreşa Rojhilat ve, ji 4’an li 3ê parçeyê Kurdistanê şoreşê bikeve meriyetê û bimeşe û her wiha li Bakur jî, rê ji şoreşê re vedibe û zemînê yekbûyîna Kurdistanê temam dibe.

Ev encam, ji nuha ve li gelê me û dostan pîroz be!



# 109 sal di ser Peymana Sykes-Picot re derbas dibin

**Lîloz Hisên/Qamişlo**

Hevpeymana Syeks Picot bandoreke mezin bi giştî li gelên herêmê kir, gelê Kurd ji gelên ku herî zêdetir êş kişand û heta niha bandora peymana kolonyalîst di hemû warên jiyanî, aborî, siyasî û çandî de berdewam e.

Peymana Sykes Picot peymaneke veşartî bû û di sala 1916’an di navbera Îngiltere û Fransayê de pêk hat, li gorî peymanê Rojhilata Navîn hate parçekirin piştî hilwişandina dewleta Osmanî. Di encamê de gelê Kurdistanê di navbera çar dewletên netewperest; Sûriyê, Îrqa, Tirkiyê û Îran de hate dabeşkirin, ku hemû siyasetên asîmîlasyon û tunekirina nasname û çandê ji hêla van dewletan ve li ser gelê kurd hate ferz kirin.

**Koka peymanê**

Danûstendin ji bo pêkanîna vê peymanê di Mijdara sala 1915‘an bi awayekî veşartî destpê kir û di Gulana sala 1916’an hate îmze kirin. Hevpeyman bi navê dîblomasiyê Fransî François Georges-Picot û siyasetmedarê Îngiltere Mark Sykes hate bi nav kirin, di hevpeymanê de herêmên di bin kontrola Fransa û Îngiltere de hatin destnîşankirin: Fransayê parçeyeke mezin ji welatê Şamê, rojavayê Enadol û herêma Mûsilê kontrol kir, di heman demê de rojavayê welatên di navbera her du çeman de di nav de Bexda û Busra kontrol kir û gihaştin kendava Erebî.




Xalên peymanê bi awayekî veşartî heta sala 1917’an man, heya ku belşefiyên Rûsyayê xalên wê aşkere kirin. Di encama vê peymanê de Kurdan navbera çar welatên dagirker de belav dike û rûbirûyî zor û zordariyê dibe.

**Xalên peymana Sykes Picot**

Peymana Sykes Picot herêmên Osmanî di Rojhilata Navîn de navbera Fransa û Îngiltere de dabeş kir.

Nîvgirava Erebistanê di navbera Îngiltere û Fransayê de dihat dabeşkirin.

Lubnan û Sûriye dê ji Fransayê re bimaya.

Bexda, Kuwêt, Urdûn, Çola Sînayê û başûrê Mezopotamyayê tev jî dê ji Îngiltereyê re bimaya.

Îngilistanê li Deryaya Spî jî dê dest daniya ser bendergehên Heyfa û Akreyê.

Îskenderûn dê wekî lîmaneke xweser bimaya.

Li Filistina ku hê di dema Ebdulhamîdê 2’em de hin parçeyên wê firotibûn cihûyan jî dê bi rêveberiyeke navneteweyî bihata birêvebirin.

Kurdistan jî di navbera her sê dewletên aliyên peymanê de dê bihata dabeşkirin.

Li gorî lihevkirinan bakurê Kurdistanê dê ji Rûsyayê re bimaya.

Hin herêmên rojhilatê Kurdistanê û rojavayê Kurdistanê dê ji Fransayê re bimana.

Başûrê Kurdistanê dê bi piranî ji Îngiltereyê re bimaya.

**Bandora peyamana Sykes Picot li ser gelê kurd**

Parçekirina erdnîgarî: Herêmên ku gelê Kurd tê de dijî di navbera Tirkiyê, Sûriyê, Îraq û Îran de hate parçekirin, bêyî ku yekîtiya wan a entîkî û çandî ber çavan bê girtin. Ev parçekirina edrnîgarî hişt ku civaka kurd di navbera sînorên navdewletî de ji hev qut bibe.

Nenaskirina netewperweriya kurd: Peymanê behsa Kurdan an mafên wan ên diyarkirina çarenûsê nekir, û Kurd bê dewletek neteweyî hişt, tevî sozên berê yên hin serokên Kurd ên li ser îhtîmala bidestxistina rêvebriyek xweser an serxwebûnê.

Mandateriyên nû: Piştî şerê cîhanê yê yekemîn, herêmên kurdî ketin bin mandateriyên Îngiltereyê û Fransî, vê yekê hişt ku berxwedaniya kurdî li dijî van hêzên kolonyalîst derkeve pêş û hewildanên nû ji bo rêveberiya xweser pêk bînin.

Bandor li ser siyaseta Kurdan: Peymanê rewşa siyasî ya Kurdan hîn aloztir kir û bû sedema zêdebûna rageşiyê di navbera wan û dewletên ku herêmên kurdan dagir dikin. Ev yek jî bû sedema derketina gelek tevgerên serxwebûna Kurd li Iraq, Sûriyê û Tirkiyeyê.

Peymanên Paşê: Peymanê rê li ber peymanên paşê vekir, weke Peymana Sevrê, ku soza avakirina dewleteke serbixwe ya Kurdî da, Peymana Lozanê ku ew soz betal kir û sînorên Tirkiyeya nûjen piştrast kir û hêviyên Kurdan ji bo dewleteke serbixwe têk bir.

Peymana Sykes-Picot xaleke girîng a veguherîner di dîroka Rojhilata Navîn de nîşan da, ku di encamê de erd û civak, di nav de Kurd jî, bi awayekî keyfî hatin dabeşkirin. Gelê Kurd xwe di navbera çend dewletên neteweyî yên nû de parçekirî dît bêyî ku mafên wî ê neteweyî an çandî bên naskirin, ev yek bû sedema bi dehsalan şer û têkoşînên ji bo xweserî û mafên neteweyî bidest bixin.

Ji bo hêviyên xwe pêk bînin kurd berê xwe dan Kongreya Silih, di Sibata sala 1919‘an li Parîsê hate lidarxistin, hewildan hate kirin ku dengê xwe bigînin û mafên rewa bidest bixin, nemaze piştî daxuyaniyên serokê Emerîkayê Woodrow Wilson ên mafê gelan di diyarkirina çarenûsa xwe de.

**Hemû peyman mehkûmê têkçûnê ne**

Peymana Sykes-Pîcotê pêk nehat. Di 1917’an de li Rûsyayê Şoreşa Oktoberê pêk hat, belşefîk bûn desthilatdar û Rûsya ji peymanê vekişiya. Komînîstan di arşîvên dewletê de nexşeyeke peymanê dîtin. Hevrêyê Lenîn, Leon Troçkî dê nimûneyeke vê peymanê di 24’ê mijdara 1917’an de, di rojnameya Îzvestiyayê de bi raya giştî re parve bikira.

Piştî ku împeratoriya Osmanî rûxiya û Îngiltereyê dest danî ser Iraq û Filistînê ew jî ji peymanê vekişiya. Peymana Sykes – Picot li gor berjewendiyên hêzên serdest sînorên nû damezirand. Di wê pêvajoyê de daxwazî û hêviyên gelê kurd hatin piştguhkirin û axa Kurdistanê bi fermî di nava 4 dewletan de hate perçekirin. Bi perçekirinê re girêdayî, civak, eşîr, malbat û hêviyên gelê kurd jî hatin perçekirin.

Peymana Sykes-Picot rê li ber peymana Sêvrê û Lozanê vekir. Ev peyman bûbû rêûresma dagirkirina Kurdistanê. Kurdistan bû çar parçe. Lê Sykes-Picot wekî spêleyekê tim li beramberî têkoşîna kurdan derdiket holê. Kurdan bi Şoreşa Rojava re carek din nîşan kirin ku ev peymaneke têkçûyî ye û hemû peymanên dagirkeriyê yên li ser Kurdistanê neçarî têkçûnê ne.

# PKK’ê vîna civakê ye!

**Sînan Cûdî**

Kongreya 12’emîn a PKK’ê ku di navbera 5-7 Gulana 2025’an de hat lidarxistin, ne tenê biryarên rêxistinî ye, lê di heman demê de destpêka serdemeke nû ji bo gelê Kurd nîşan dide.

Wateya van biryaran, bi taybetî ji bo gelê Rojava, pir kûr e. Nirxên ku PKK’ê di 40 salên damezrandina xwe de ji bo gelê Kurd aniye, bi vê biryara feshê ve nehatine jêbirin; Berevajî vê, ew bingeha xeta têkoşînê ava dike ku dê di astek cûda de berdewam bike. PKK’ê bi têkoşîna xwe ya ji sala 1978’an vir ve, siyaseta dewletê ya li ser înkarkirina hebûna gelê Kurd ava bûye şikand û nasnameya Kurd hem li Tirkiyê û hem



jî li Rojhilata Navîn da naskirin. Ne tenê wekî hêzek leşkerî, lê di heman demê de wekî tevgerek gel jî xwe ava kiriye û bi bîrdoziya xwe ya rizgariya jinan û paradîgmaya civaka demokratîk, ne tenê ji bo gelê Kurd, lê ji bo hemû gelên herêmê bûye hêvî. Ev xet rasterast beşdarî pêkanîna Şoreşa Rojava bû. Veguherîna civakî ya ku, bi taybetî di bin pêşengiya jinan de, pêşketiye, nîşaneya pratîkî ya berhevkirina îdeolojîk a PKK’ê ye ku di nav gelek salan de dom kiriye. Di dilê biryarên ku di Kongreya 12’an de hatine girtin de sê hêmanên bingehîn hene: Fesihkirina rêxistinî ya PKK’ê, bidawîanîna rêbaza têkoşîna çekdarî û derbasbûna bo serdemeke nû ya têkoşînê li ser bingeha siyaseta demokratîk di bin serokatiya Rêber Apo de. Ev biryar ne tenê ji aliyê formê ve, lê di heman demê de ji aliyê naverokê ve jî îlankirina şêwazek nû ya têkoşînê ye. PKK’ê ragihandiye ku mîsyona xwe ya dîrokî bi dawî aniye û niha têkoşînê radestî rêxistinkirina gel, siyaseta demokratîk û avakirina civakî dike.

Ev biryar ji bo gelê Rojava gelek wateyên girîng dihewînin. Pêngava yekem ew e ku rê li ber avakirina civakeke demokratîk êdî li ser modêla Rojava dê xurttir bê pêşxistin.

Devjêberdana têkoşîna çekdarî ji aliyê PKK’ê ve di bingeh de ne gelê kurd bê çek dike, dijminên gelê kurd bê çek dike. Ji ber em tev dizanin bi salan e di bin navê hebûna PKK’ê û şerê çekdarî hemû êrişên dagirkerîyê dikaribûn meşrû bikin. Duyemîn, rewatiya Rojava di qada navneteweyî de wê zêde bibe. Lawazkirina tohmetên “terorîzmê” yên bi PKK’ê ve girêdayî dikare bihêle ku Rojava di têkiliyên xwe yên derve de bi hêsanî manevra bike. Bê guman, ev pêvajo hin xetere û berpirsiyariyan jî bi xwe re tîne. Eger dewleta Tirkiyê vê biryarê ne wekî bangek ji bo aştiyê, lê wekî “teslîmbûn” an “serkeftin” şîrove bike, pêvajoyeke nû ya demokratîk dikare were astengkirin. Ji ber vê sedemê, Meclîsa Mezin a Neteweyî ya Tirkiyeyê, partiyên siyasî û raya giştî divê bi hestek berpirsiyariya dîrokî nêzîkî vê biryarê bibin.

Di heman demê de, divê gelê Kurd fêm bike ku faktora diyarker di têkoşînê de êdî ne hêzên çekdar in, lê civaka rêxistinkirî ne. Rastiyeke gel ku di bin pêşengiya jin, ciwan û karkeran de ziman, nasname, çand û mafên xwe yên civakî diparêze, dê hilgirê rastîn ê serdema nû be.

Fesihkirina PKK’ê ne dawî ye; destpêkek nû ye. Şêweyê têkoşînê diguhere, lê eslê wê bi armanca civakeke demokratîk û jiyana azad berdewam dike. Ji bo gelê Rojava, ev biryar tê vê wateyê ku destkeftî dê mayînde bibin û qonaxek nû ya berxwedanê dê bi sivîlbûnek zêdetir û rêxistinên herêmî yên bihêztir dest pê bike. Ev veguherîn, dema ku bi awayekî rast were fêmkirin, dê dîroka berxwedana sedsalî ya gelê Kurd bigihîne qonaxek nû. Her çiqas navê PKK’ê bê jêbirin jî, îdealên ku ew temsîl dike dê di jiyana rêxistinkirî ya gel de her zindî bimîne.